# Leşkeran pankarta bi kurdî daxist

Şaredariya Geverê, bi munasebeta Cejana Qurbanê di ketin û derketina Geverê de pankartên pîrozbahiya Cejan Qurbanê yên bi kurdî "Cejna we ya Qurbanê Pîroz be" lê hatibûn nivîsandin daliqandin. Lê ji aliyê leşkeran ve bi hinceta "Çûn û hatinê asteng dike" anîn xwarê... *R.3*







# Walî qedexe kir lê gel bi biryar e

**Waliyê Amedê salvegera damezirandina PKK'ê wekî hincet nîşan da û 1'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Fîsê qedexe kir. Lê îro parlamenter, şaredar, nûnerên saziyên sivîl bi beşdariya gel dê biçin gundê Fîsê**

Mîhrîcana Çand û Hunerê ya dê di 28'ê mijdarê li gundê Fîsê pêk bihata rastî astengiya walîtiya Amedê hat. Waliyê Amedê ji ber ku 28'ê mijdarê damezirandina PKK'ê ye destûr neda û wek hinceta qedexekirinê salvegera damezirandina PKK'ê nîşan da. Şaredara Licê Fîkriye Aytin diyar kir ku dê îro li navenda Licê bernameya xwe pêk bînin û biryarê şermezar bikin. Her wiha komek temsîlî dê biçe gundê Fîsê. ... *RÛPEL 9*

ROJEV
28 Mijdar - Şemî 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 16

## Rewşa xeter biryarê ferz dike

Pêkanînên li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan mirov matmayî dihêlin. Niha dem hatiye ku DTP bi awayekî rêk û pêk rewşa heyî binirxîne û li gorî wê polîtîkayekê pêş bixîne. Gelo em li ser fikirîn ka di van mehên dawî de çi bûyerên balkêş qewimîn?

Tayip TEMEL - R.2

# Li Îmraliyê pêkanînên xeternak ketin dewreyê

# 'EV ÇALA MIRINÊ YE'

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan aşkera kir ku şertên ew niha tê de ye her roj wî ber bi mirinê ve dibin û wiha got: 'Cihê nû ez xistimê wekî çala mirinê ye. Li vir 24 saetên wekî îdamê ne. Nikarim nefesê bigirim'



## 'Berpirsiyarên esasî CPT û DMME ne'

*Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji dijwarkirina şertên Îmraliyê û guhertina cihê xwe, CPT'ê û DMME berpirsyar girtin. Ocalan wiha dewam kir: "CPT û DMME'yê girtîgeha nû pêşniyar kir. Ev projeya wan e. Ji şertên vê derê û bi vî rengî hiştina min ya li vir, ew berpirsyar in. Ev projeya wan e. Lewre divê ew bên protestokirin."*

### 'HÎS DIKIM HUCREYÊN MIN DIMIRIN'

Ocalan roja çarşemê hevdîtina bi parêzerên xwe re pêk anîn û got ku bi guhertina cihê wî, pirsgirêkên wî yên tenduristiyê gihiştine asteke xeter. Ocalan wiha got: "Bêhewatî bandor li hemû fonksiyonên bedena min dike. Tê zanîn, dema mirov bêhewa bimîne, hucreyên mêjiyê wî dimirin. Ez jî li vir hîs dikim ku, ji ber bêhewatiyê hucreyên mêjiyê min dimirin. Serê min diêşîne."

### 'EZ NIHA DI ÇALA MIRINÊ DE ME'


Ocalan destnîşan kir ku klîmaya Grava Îmraliyê û dengê jenaratorê jî wî eciz dike û got: "Ez bi xwe, 11 sal in li vir li ber xwe didim. Eger baweriya min ya evqasî xurt tune bûya, ez ê li vir biketima nav hewldanên çalakiyên întiharî. Helbet li vir dikarim her deqe bimirim jî. Cihê min yê niha, wekî çalakê mirinê ye."... *RÛPEL - 8*

## Însiyatîfa Gel: Li dijî pêkanînan her çalakî rewa ye

Însiyatîfa Gel a Demokratîk a Kurdistanê bi daxuyaniyeke nivîskî ji hemû gelê kurd xwest ku li dijî pêkanînên li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, her derê vegerînin qada berxwedan û serhildanê. Di daxuyaniya ku bi tundî hat kirin de Hikûmeta AKP'ê hat hişyarkirin û wiha hat gotin: "Nêzîkatiyeke şaş a li dijî Rêber Apo, ji bo gelê kurd sedema şer e. Divê ku hemû kurdên li Tirkiyeyê û Kurdistanê li dijî vê rewşê bi ruhê serhildanê rabin û li dijî vê hikûmeta şerê taybet û durû hesabê vê yekê bê pirsîn."... *RÛPEL 7*

# 'Li hemberî rewşê bêdeng nemînin'

**Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî rewşa muwekîlê xwe ya Girtîgeha Tîpa F ya nû diyar kirin ku bi cihguheztina Ocalan mercên wî girantir bûne û rastî 20 roj cezayê hucreyê hatiye. Parêzerên Ocalan bal kişandin ser banga Ocalan û wiha gotin: "Muwekîlê me got, 'Ez avêtime çala mirinê. Li hemberî vê helwestê ez bang li hemû raya giştî dikim ku li hemberî vê yekê bêdeng nemîne'. Parêzeran, diyar kir ku şertên li Girava Îmraliyê yên nû ji aliyê hiqûqî ve li pêş lê ji aliyê civakî ve sînorê jiyandinê jî ji holê rakirine. Parêzeran anî ziman ku li gorî şertên DYA û CPT'ê cihê 6 metrekare ji bo kesên 2-3 rojan binçavan de jî bimîne nayê qebûlkirin."...**
*RÛPEL 7*



## Gençdal: Em ê toreke têkoşînê ava bikin

Gerên komên aştiyê ku bi sê baskan hatine destpêkirin, berdewam dikin. Berdevkê Koma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ya Qendîlê M. Şerîf Gençdal diyar kir ku aştî bi têkoşîneke civakî pêkan e û wiha got: "Em dixwazin bi civînên gel toreke têkoşînê ava bikin."... *R.7*

## Li leşkeriyê mirineke din a bi guman

***Di nava*** Artêşa Tirk de leşkerên ku întihar dikin her diçe zêdetir dibin. Herî dawî li Şirnexê leşkerê bi navê Sedat Horoz întihar kir. Ji sala 1991'an heta niha 15 boluk leşkeran întihar kir. Li Şirnexê leşkerê bi navê Sedat Horoz ku ji bajaroka Bulam a Semsûrê ye, ji ber sedemek nehat zanîn 'Întihar' kir. Bavê Horoz, Zemçî Horoz got pirsgirêka kurê wî tunebû û ne mimkûn e ew xwe bikuje. *RÛPEL 3*

## Kurdan berê xwe da ser gorên şehîdan

***Bi*** munasebeta Cejna Qurbanê û 27'ê Mijdarê 31'emîn salvegera damezirandina PKK'ê li Amed, Wan, Sêrt, Sirnex, Colemêrg, Cizîr, Sîlopî û Hezexê bi hezaran kes çûn goristanan û gorên kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane ziyaret kirin. Girseyê di ziyaretan de dîsa doza aştiyeke bi rûmet kirin...*RÛPEL 6*

www.arsivakurdi.org



DOSYA
DESTANA VEJÎNÊ PKK -III-
NAVENDA NÛÇEYAN

## Îmralî dibe lekeyek di dîrokê de...

Ocalan ku 30 sal berî niha PKK afirand, îro hêjî li girtîgela takekesî ya Îmraliyê di bin şert û mercên giran de û di bin tecrîdê te tê girtin... Bi rastî jî sîstema Îmraliyê dibe lekeyeke qirêj ku li eniya mirovatiyê ketiye. Êdî gelê kurd jî li dijî zilma Imraliyê û li dijî sîstema wê, dibêje "Êdî Bes e!"...

### Wekî gelek nûjeniyan di warê zayendî de jî serdemek nû vebû

# PKK'ê jin ji gorê rakir

**Di nava PKK'ê de bi sedan jinên şoreşger, bi îdiayeke mezin, bi biryarbûn û berxwedaneke bêhempa, bi rihekî fedayî dîroka berxwedana jinê ya cîhanê bi tîpên zêrîn ji nû ve nivîsand**

Stêrkek ku li astîmanê Welatê Rojê dibiriqî... Stêrkek geş ku çavê xwe gel, netewe û li kesên bindest dinuqand. Li zarok, jin, hozan, helbestvan û bi kurtî, her kesê ku bêje, ez heme û ez "mirov im", vê strêrkê çavê xwe lê diniqand...Evîndara Azadiyê, fedakara gelê Kurd û hêviya bindestan, berxwedêra şoreşger Bêrtîna, yanî Bêrîtan Hêvî, ango Gulnaz Karataş, yanê Jeanne D'Arca Kurdan...

Cihê ku Jeanne D'Arc lê hebin, bêguman, helbet wê teslîmiyet, xiyanet û nankorî jî çêbe.

*Xayînên ji Qewmê Kewê... / Bûne neyarê qewmê xwe.../ Drakulayên ku xwîna xwîşk û birayên xwe mijtin.../Çeteyên xayîn ku bedena xwîşka xwe ya di nava xwînê de mayî, radestî neyaran kirin...*

'Harpagosên hemdem' ku serê birayên xwe di nava sêniya zêrîn de pêşkêşî mîtîngerên Kurdistanê kirin...

Îja wê rojê, yanî 25'ê cotmehê, çete û neyarên qewmê xwe, Harpagosê hemdem, tîma Bêrîtanê dorpêç dikin, Bêrîtan jî tîma xwe diparêze û wan ji xeleka dorpêçkirî rizgar dike. Di vê heynê de ji sing, rû û milê xwe birîndar dibe.

Êdî bedena Bêrîtanê di nava xwînê de dimîne. Xwîna sor êdî bedena pîroz a Bêrîtanê dineqişîne. Neyarên ji qewmê kewê, êdî biryarê didin ku wê radestî dijminên dagirker û mitînger bikin.

**Dêrsim tê ber çavê wê...**

Bêrîtan dide bîra xwe, dema ku li Dêrsimê keçên kurd ketin destê leşkerên dagirker ên Tirk, çi hate serê wan...

Fatêya keça Nûrî Dêrsimî hate bîra wê... Bi dengekî bilind ji xwe re got, "Belê divê ez bibim Fatê, divê ez wekî Fatê biqîrîm. Wekî Fatê ji serê vî çiyayê bifirim ber jêr. Divê ez bi rihê xwîşkên xwe re rast bim û bi bîranîna wan ve girêdayî bimînim û bi saxî nekevim destê dijmin."

Neyarên ji qewmê Kewê bê navber bang dikirin "Keçê Teslîm be!" Bêrîtan jî derketibû serê lûkteya bilind a tehtekî û li banga neyaran guhdarî dikir. Careke din Dêrsim anî ber çavên xwe. Serhildan û komkujiyên Kurdistanê anîn bîra xwe. Çawa ku jin, zarok, kal û pîr bi hev re hatin qetilkirin û hatin kuştin. Careke din hemû zilm û zor di ber çavên xwe re derbas kirin...

Ji nişkave rabû ser xwe. Dît ku neyarên ji qewmê kewê tevî dijmin, derdora wê girtine. Bi dengekî nizim ji xwe re got: "Êdî xilas."

Û dom kir: "Ev der, ev teht, ev raz û ev newal, ev çiyayê bi heybet, wê bibe cihê min ê dawî ku ez li bi çavên vekirî li dinyayê dinêrim, li rêhevalên xwe difikirim, wê bibe cihê ku ez li ser navê jinên kurd nefesa dawî bistînim. Li vir, li ser vî çiyayê, wê dîroka berovajî kirî ya jina kurd bi dawî bibe...

Piştî çend saniyeyên din, ew bayê ku niha porê min dihejîne, ev deşt û newal ku, dengê minê tê de olan bide, wê heta hetayê bibe qêrîna pîroz a azadiya jinên kurd..."

Û Bêrîtan xwe ji çiyê davêje û wekî tîrekî ber bi jêrê tê. Bi qêrîneke tijî bewarî bedena wê li erdê dikeve û piştî 10 salan, rêhevalên wê termê wê yê pîroz radikin Goristana Şehîdan û ji nû ve dispêrin çiyayên azad ên Kurdistanê û dispêrin axa pîroz...

Ocalan jî li ev yek wiha nirxandibû: "Bêrîtan ji bo me şîret e, ji bo me vesiyat e. Ew ji bo me bangek e. Ew ji bo me Jeanne D'Arc e...Emê wê ji xwe re wekî bingeh qebûl bikin. Ew rûmeta me ye. Çalakiya wê, çalakiya evînê, çalakiya rûmetê ye..."

**Dirûşma; 'Jin jiyan azadî'**

Dema behsa PKK tê kirin, cihê jinan û keda wan jî nayê înkarkirin. Jinên kurd bo cara yekem bi şoreşa PKK'ê re tama azadiyê dîtin, zanîn ku azadî çi ye û di di warê pratîkî de jî bo cara yekem di nava PKK'ê de azadî bi çavên xwe dîtin. Bi sedan jin bi awayekî fedayî, di warê pratîkî de jî, ketin nava hewildanên xwe nasînê û qêrîna xwe ya ji bo azadiyê, hesreta ji bo têkoşîneke bi rûmet derxistin holê û careke din bi tevgera PKK'ê re nîşanî hemû cîhanê dan ku wê tu carî teslîmî zilm û zorê nebin.

Di nava PKK'ê de bi sedan jinên şoreşger, bi îdiayeke mezin, bi biryarbûn û berxwedaneke bêhempa, bi rihekî fedayî, bi helwestên Bêrîtan, Zîlan, Sema, Şîlan, Nûda û Viyanan, bi helwesta şoreşgerî û baweriya "Yên ku têdikoşin, azad dibin, yên azadbûyî bedew dibin û yên bedew jî têne hezkirin", heta dawiyê li ber xwe didin û ji bo azadiya jina kurd û ji bo azadiya gelên bindest têdikoşin. Bi vî awayî gihîştine rastiya jinê û hêza têkoşîna wê derxistine holê.

Di warê jinan de, ji bo ku karibin koletiya bi hezaran salan helweşînin û bigihîjin azadiya xwe, tu rêyek tuneye ji bilî riya ku têbikoşin û wekî Bêrîtanê bi serbilindî rawestin, wekî Zîlanê bibin bombe, wekî Viyanê bibin agirê azadiyê, Gurbet û Mêryemê li dijî koletiyê serî hildin, wekî Zekiye û Rehşanê bibêjin Êdî bes e...

**Roja Reş: 9 Cotmeh**

Dîrok 9 Cotmehê... Hêzên navneteweyî bi pêşeniya hêzên kompologer yên wekî Ingilistan, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Îsraîlê û Tirkiyeyê, xwestin ku di kesayetiya rêberê Gelê Kurd A. Ocalan de, Tevgera Azadiyê esfiye bikin û gelê kurd bi sîstemê ve girê bidin û bixin bi kontirola xwe, lewre hêzên navneteweyî ji Sûriyê xwestin ku Ocalan ji Sûriyê derxe, ger dernexe wê bibe hedefa şer. Bi vî rengî gef li Sûriyê xwarin.

Bi vî rengî Sûriye neçar mabû ku teslîmî zexta navdeweltî bibe. Bi vî rengî Ocalan roja 9'ê Cotmehê ji Sûriyê derket û ber bi Ewropayê bi rê ket.

**Roja qiyematê; 15'ê Sibatê**

Ewrekî reş ketibû ser asîmanê gelên Kurdistanê...

Roja 14 sibatê li Paytexta Kenyayê bajarê Nayrûbiyê, hêzên Keniyayê, di berbanga sibê de, dora avahiya baylozxaneya Yûnanistanê dorpêç kirin û xwestin ku bikevin hundir. Roja 15 sibatê jî diyar kirin ku destûr neyê dayîn wê bi zorê bikevin hundir.



Ocalan ku dibîne, dora wî hatiye girtin, qebûl dike ku biçe balafirgehê... Ocalan û ekîba pê re bi sê wesayîtan dikevin ser rêya balafirgehê. Piştî demekê, dibînin ku balafireke nediyar li pîstê rawestaye û tîmên taybet bi zorê Ocalan direvînin û ber bi Tirkiyeyê difirin. Ev yek ji bo gelê kurd felaketeke mezin bû û bi vî rengî wekî Roja Reş hate binavkirin.

Belê bi vî renî bi alîkariya NATO, Amerîka, Israîl, Ingilistan, Yûnanistan, Almanya, Rûsya û Tirkiyeyê, kompoloya bêbext pêk hatibû. Ocalan, li ber çavê mirovahiyê, bi rêbazên dij mirovî, li ber çavê cîhanê bi awayekî bêbext, hatibû revandin û anîbûn Tirkiyeyê...

**Manîfestoya aştiyê...**

Rêberê gelê Kurd A. Ocalan hatibû revandin û teslîmî Tirkiyeyê hatibû kirin, lê tu carî hêviya xwe ya bi çareseriyê winda nekiribû. Wî tim digot: "Dawiya her şerekî aştî ye.". Tim di hevdîtinên xwe de bi lêv dikir ku "Şerên mezin aştiyên mezin jî pêk tînin" û ji bo aştiyê dest bi afirandina Manîfestoyeke nû kir...

Li gorî manîfestoya nû, çêk bi awayekî dualî bihatana bêdengkirin, wê hêzên gerîla derketana derveyî sînorên diyarkirî yên Tirkiyeyê, wê du komên gerîla wekî qasidên aştiyê bihata Tirkiyeyê, wê Tirkiyeyê jî rê bida wan koman ku ji bo aştiyê bixebitin. Gelê kurd û tirk di nava wekheviyê de bi awayekî aştiyane bijiyana...

Bi vî rengî careke din hêviyên aştiyê hatibûm pûçkirin. Careke din gel li hev hatibûn sorkirin û dixwestin ku wan bixin pêsîra hev. Artêşa Tirk careke din li dijî gelê kurd, sûcên dijmirovî pêk dianîn, li dijî gerîla operasyon li dar dixistin, gund dişewitandin û valadikirin, dol, newal, deşt, zozan û çiyayên Kurdistanê bombe dikirin û daristan û xwezaya welat dişewitandin. Serokwezîrê Tirkiyeyê R. Tayip Erdogan bi gotina "Jin be jî Zarok be jî, çi pêwîst be wê bê kirin," zarok û jinên kurd dikirin hedefa êrîşên polîsên tirk. Bi vî awayî fermana kurdan derxistibû... Û artêşa tir, polîs û hêzên çekdar ên Tirkiyeyê, wekî berê, ji wê rojê û pê ve bi awayekî dijwartir, kurd kuştin, zarkoên kurd bi hovitî kuştin, jinên kurd işkence kirin...

Lê belê, xuyaye ku Serokwezîrê Tirk Erdogan, Fermandarê Artêşê Yaşar Buyukanit û tevî Îlker Başbûg, Hêzên Parastina Gel ji bîr kiribûn. Qet nefikirîbûn ku ew hêzê, wê xwe, gelê xwe, zarok û jinên kurd biparêze...

Îca ji Gabarê heta Oramarê, ji Zapê heta Bêzelê destan hatin nivîsandin, şer li çar aliyê Kurdistanê belav bû û sedam vî şerê giran jî ev zilm û zora wan bû...

Ji ber vê zilma wan bû ku li Gebar, Oremar û Zapê bi dehan leşkerên tirk hatin kuştin û ji ber zilma wan bû ku bûne sedem hêjî dayîk digrîn...

Meşa bi heybet a Qasindên Aştiyê ku ji Qendil û Mexmûrê heta Amedê bi awayekî bi coş pêk hat, dîsa nekarî pêvajoya bi xwîn rawestîne. Ji ber ku hêjî celad xwînê dirijînin û êrişên xwe dewam dikin. Ocalan niha jî li ber xwe dide. Bêguman azadiya Ocalan, azadiya Kurdistanê û azadiya gelê kurd e. Azadiya Ocalan, bi awayekî demokratîk çareseriya pirsgirêka kurd e. Hatina aştî û azadiyê bo Kurdistanê ye. Tê wateya ku gelê kurd û tirk wê karibin di nava aştiyê de, di nava wekheviyê de bi hev re bijîn... *(Bi dawî bû)*



Deng

## Ji bo DTP'ê dema biryarên nû ye...

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Demeke dirêje ku rayedarên hikûmetê û nûnerên dewletê bi hin daxuyaniyên 'erênî' dixwestin wisa bidin hîskirin her wekî ew dixwazin pirsgirêka kurd çareser dikin. Ligel vê helwestê her tim bi riya çapemeniya alÎgira xwe diranên xwe nîşanî kurdan didan û wiha ji wan re digotin; 'Heke hûn dev ji PKK û Ocalan bernedin dê belayên neditî bên serê we.'

Welhasil îro rewş hatiye wê astê ku êdî rûyê xwe yê rast nîşanî kurdan didin. Wekî mînak; şûna ku Bahçelî kurdan bike hedefa êrîşên faşist, Cemîl Çîçek û rayedarên hikûmetê vê yekê dikin. Pir watedar e ku Erdogan got; 'Ew ne sîmgeyên cuda hiltînin û lewre xelkê Îzmîrê êrîşî wan kiriye.'

Di bin vê gotinê de ev zihniyet heye; 'Heke hûn neyên ser rê em ê we bidin lînckirin û qirkirin.' Ma li kîjan welatî hatiye dîtin ku Serokwezîrek êrîşa komeke faşîst a bi kevir rewa bibîne û yên rastî êrîşî hatîn sûcdar bike?

Jixwe Cemîl Çîçek starta êrîşî rojekê piştî hilbijartina şaredariyan dabû. Beriya niha jî gelek caran hatibû gotin ku zihniyeta qirkirina kurdan hê jî li Tirkiyeyê serdest e. Belê ev rastiyeke ku mirov xemgîn û dilkeser dike. Lê ya ecêptir ew e ku kesên bi îdiaya çareseriya pirsgirêka kurd û demokratîkkirinê derketine rê pêşengiya vê zihniyeta qirkirinê dikin.

Êdî divê her zarok bizane ku yên lînca kurdan diparêzin û wê teşwîq dikin ne mimkûn e ku pirsgirêka wan çareser bikin û demokrasiyê bînin Tirkiyeyê.

Niha dem hatiye ku DTP bi awayekî rêk û pêk rewşa heyî binirxîne û li gorî wê polîtîkayekê pêş bixîne.

Gelo em li ser fikirîn ka di van mehên dawî de çi bûyerên balkêş qewimîn? Em çend ji wan bi bîr bînin;

✓ Parêzerê Ocalan Îbrahîm Bîlmez ji bo ku der barê rewşa derve û pêşkeftinên siyasî de muwekîlê xwe agahdar kiriye bi 6 sal û 4 meh cezayê girtîgehê hate cezakirin. Bi vî cezayî ev peyam dan parêzeran; 'Me li wir tecrîdek ava kiriye. Hûn nikarin bi agahdarkirin û axaftinên xwe vê tecrîdê bêwate bikin. Ên wisa bikin dê parêzertiya wan ji dest bê wergirtin.'

✓ Parêznameya Ocalan a ku wekî parastin pêşkêşê DMME'yê kiriye û di bin kontrola rayaderên dewletê re jî derbas bûye bêyî ku hincet bê nîşandan bê bandrol hate hiştin. Dema ku weşanxaneyê ev pirtûk şand herêman jî bêyî hincetek bê dîtin li Wanê wêneyê Ocalan kirin hincet der barê pirtûkê de biryara berhevkirinê hate dayîn.

✓ Di 17'ê cotmehê de Ocalan neqlî girtîgeha nû hate kirin û ev yek di bin navê sererastkirin û qenckirina şert û mercên li Îmraliyê de hate kirin. Lê derket holê ku ev pêngav ji sedî sed ji bo kûrkirin û mezinkirina îzolasyonê pêk hatiye. Di hevdîtina dawî de jî Birêz Ocalan bi berfirehî li ser şertên tê de sekînî navê 'kuştinê' li vê yekê kir.

Jixwe ji bilî van kirinên li ser Ocalan bi sedan daxuyanî, êrîş û heqaret li siyasetmedarên kurd û hebûna gelê kurd hatine kirin. Siyasetmedarên kurd hê jî di girtîgehê de ne û heta niha ji bilî mijara Dêrsîmê tu helwest li hemberî van êrîşên kûr û xeternak nehatiye nîşandan. Di merheleya heyî de divê di serî de DTP'ê û hemû saziyên kurd rûnin û biryara xwe bidin. Riyeke din ji bo me nema ye.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91 Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır

# Li qişlayê 'întihareke' din

**Hejmara leşkerên ku tê îdiakirin 'întihar' kirine roj bi roj zêdetir dibe. Herî dawî li Şirnexê leşkerekî 'întihar' kir. Malbata leşkerê bi navê Sedat Horoz diyar kir ku tu pirsgirêkeke kurê wan tune bûye û ew bawer nakin ku kurê wan 'întihar' bike**

NAVENDA NÛÇEYAN / AMED

Di nava Artêşa Tirk de leşkerên ku întihar dikin her diçin zêdetir dibin. Herî dawî li Şirnexê leşkerê bi navê Sedat Horoz întihar kir. Ji sala 1991'an heta niha 15 boluk leşkeran întihar kir.

Li Şirnexê leşkerê bi navê Sedat Horoz ku ji bajaroka Bulam a Semsûrê ye, ji ber sedemek nehat zanîn 'Întihar' kir. Bavê Horoz, Zemçî Horoz ku li Edeneyê rûdinê, diyar kir ku tu pirsgirêka kurê wî tunebû û ne mimkûn e ku kurê wî întihar bike.

Li leşkeriyê hejmara kesên bi angaşta "Întihar kiriye" ku piraniya wan kurd in roj bi roj zêde dibe. Herî dawî di 25'ê mijdarê de li Şirnexê kesê bi navê Sedat Horoz ku ji bajaroka Bûlamê ya Semsûrê bû "Întihar" kir.

**Malbat bawer nake**

Bavê Sedat Horoz, Zemçî Horoz, diyar kir ku tu sedema ku kurê wî întihar bike tune û wiha got: "Serbaz û 3 leşker hatin mala min. Di serî de gotin serê te sax be. Piştre gotin 25'ê mijdarê de kurê te întihar kiriye. Kurê min 15 roj berê hatibû destûrê. Tu pirsgirêkên wî tunebûn. Tu sedemên ku întihar bike jî tunebûn. Dê cenazeyê kurê min were Edeneyê. Ez ê sedema wê lêkolîn bikim û bişopînim. Piştî raporê çi pêwist be em ê bikin."

Hate hînbûn ku cenazeyê Horaz dê li Edeneyê bê definkirin.

**Di travmayê de ne**

Li gorî daneyên fermî di nava Artêşa Tirk de ji 1991'an heta 2001'an hezar û 248 leşkeran întihar kirine û ji van 815 leşker mirine. Piştî 2001'an der barê întiharkirina leşkeran de daneyên fermî nîn in. Lê bûyerên ku di çapemeniyê de derdikevin nîşan dide ku hejmara leşkerên ku "întihar" kirine, hejmara 10 salan derbas bûne. Li gorî van daneyan ji 1991'an heta niha 15 boluk an jî 2 tabur leşkeran "întihar" kirine.

Psîkologê bi navê H.A ku li Nexweşxaneya Leşkerî ya Gulhaneyê dixebite der barê întiharên leşkeran de diyar kir ku bi taybetî leşkerên ku li bajarên Kurdistanê leşkeriyê dikin travmayê dijîn. Li gorî H.A'yê ji 10 leşkeran 7 leşker di travmayê de ne.

H.A diyar kir ku tenê di 2006'an de li Gulhaneyê 2 hezar leşker hatine tedawîkirin. Salê herî kêm 3 hezar leşker ji bo tedawiyê serî li nexweşxaneyê didin. Lê ji van ancax 500 an jî 700 leşker ji bo tedawiyê têne qebûlkirin. Yên ku têne qebûlkirin jî bêhtir pirsgirêkên psîkolojîk dijîn û di depresyonê de ne. Ji bilî van yên ku pirsgirêkên fîzîkî dijîn jî hene. Piraniya wan jî dîsa tedawiya psîkolojîk dibînin. Ji ber ku pirsgirêkên fîzîkî dibin sedema pirsgirêkên psîkolojîk.

H.A got ku ji sala 1990'an heta 2000'an nêzîkî 35 hezar leşker ji bo tedawiya psîkolojîk serî li wan dane û hatine tedawîkirin.

# Redkarên wijdanî xwe rêxistin dikin

Federasyoan Komaleyên Ciwanên Sosyalîst, dê ji bo redkariya wijdanî komcivînekê li dar bixe. Serokê Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst Ozan Emre Ozyilmaz, der barê komcivîna ku dê pêk bê de diyar kir ku destê aştiyê yê ku kurdan dirêj kiriye, dê bigihîje destê tirkan ê biratiyê û wiha axivî: "Her wiha em dê di komcivînê de nîqaş bikin da ku dê têkoşîna aştiyê çawa bê berfirehtirkirin. Ozan Emre Ozyilmaz bi lêv kir ku ew dê xwerexneya xwe ya pratîk bi vê komcivînê bidin.

Federasyon, ji bo kom civînê bi hin komên ciwanan re jî hevdîtin pêk anîne. Ciwan, li ser rastiya 'Pêdiviya ciwanên tirk jî bi aştiyê heye' dest pê kirine û redkariya wijdanî jî 'Destê aştiyê yê ku kurdan dirêj kiriye, dê bigihîje destê tirkan ê biratiyê' rave dikin. Ev komcivîn ji bo ciwanên sosyalîst di wateya xwe rexneyekê de ye.

Serokê Federasyona Komaleyên Ciwanên Sosyalîst Ozan Emre Ozyilmaz, der barê amadekariyên komcivînê de hin agahî dan. Ozyilmaz diyar kir ku ev biryar li ser pêşniyarên endamên xwe girtine û wiha pê de çû: "Em dixwazin ku li dijî leşkeriya bi zorê derkevin. Em dê li dijî vî şerê qirêj ku bi deh salan e tê domkirin, têkoşîna xwe ya redkariya wijdanî bi rêxistin bikin û ji aliyê ciwanên tirk ve redkariya wijdanî berz bikin."

Ozan Emre Ozyilmaz, anî ziman ku wan ji bo vê civînê bi hin komên ciwanan re jî hevdîtin pêk anîne wiha got: "Me bi hin rêxistinên ciwanan ên ku wekî hev li pirsgirêka kurd dinêrin re hevdîtin pêk anîn. Lê wan jî ji me re got ku ew dê piştgiriyê bidin me lê ji ber rojevên xwe yên lêhûr dê bi awayekî aktîf nikaribin beşdar bibin. Em bi hin hevalên redkarên wijdanî ku li zaningehên ODTU û Bogaziçiyê dixwînin re axivîn. Em wisa difikirin ku pêvajoyê bi navê 'Redkarên wijdanî yên ji bo aştiyê' bi rêxistin bikin.

Ozyilmaz bal kişand ser giringiya komcivînê jî û wiha got: "Pêdiviya me hemûyan bi aştiyê heye. Bi qasî kurdan, pêdiviya tirkan jî bi aştiyê heye. Bi salan e têkoşîneke bi rûmet tê meşandin û niha jî di çareserkirina pirsgirêka kurd de em hatine qonaxeke ku êdî kes nikare vegere.

Divê ku mirov li tiştên AKP dibêje nenêre, kî pê dide gotin, binêre. Pêkhatina aştiyeke bi rûmet tenê bi têkoşîna tevgera kurd pêkan e. Divê ku destê kurdan ê ku ji bo aştiyê hatiye dirêjkirin li erdê nemîne û ji aliyê Tirkiyeyê ve jî destê aştiyê bê dirêjkirin. Ev yek gelek girîng e. Em jî wekî ciwanên sosyalîst ên tirkiyeyî li dijî vî şerê qirêj derkevin û nehêlin ku xwîna ciwanan birije. Em dê qêrîna aştiyê bi dengekî xurt biqîrin.

Ozan Emre Ozyilmaz, dest nîşan kir ku çalakiya redkariya wijdanî heta niha pasîf dihat dîtin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Belê, heta niha ciwanên sosyalîst çalakiya redkariya wijdanî wekî çalakiyeke pasîf didîtin û ji ber vê yekê jî xwe dûrî van çalakiyan digirtin. Lê redkariya wijdanî li dijî pergal û recmê çekek bi hêz e û heke ku bigihîje girseyên mezin, gelek deng tîne. Em ji bo leşkeriya artêşa Tirkiyeyê ya mêtinger nekin û piştgirî bidin têkoşîn û xwesteka azadiyê ya kurd, çalakiyên redkariya wijdanî tînin rojevê." STENBOL

# Gerîlaya HPG'î hate bibîranîn

Gerîlaya HPG'î Alîye Tîmur, ku sala par li navçeya Çelê ya Colemêrgê di pevçûnê de jiyana xwe ji dest dabû li ser gora wê hate bibîranîn.

Gerîlaya HPG'ê Aliye Tîmûr ku par li navçeya Çelê ya Colmêrgê li gel 8 hevalên xwe jiyana xwe ji dest dabû li Wanê hate bibîranîn. Di merasîma bîranînê de Parlementerê DTP'ê Ozdal Uçer û rêveberên DTP'ê amade bûn. Komên di bîranînê de ji bo kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane deqeyek rêz girtin. Ozdal Uçer, li ser gora Tîmûr axaftinek kir û diyar kir ku ev kesên di têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest didin tu carî nayên jibîrkirin. Kom piştî bîranînê çûn malbata Tîmûr ziyaret kirin. WAN



# Leşkeran tehamûlî pankarta bi kurdî nekir

Şaredariya Geverê, bi munasebeta Cejna Qurbanê di ketin û derketina navçeya Geverê de pankartên pîrozbahiya Cejna Qurbanê yên bi kurdî "Cejna we ya Qurbanê Pîroz be" hatibûn nivîsandin daliqandin. Lê ji aliyê leşkeran ve bi hinceta "Çûn û hatinê asteng dike" anîn xwarê. Şaredara Geverê Ruken Yetîşkin jî diyar kir ku ev yek bêtehamuliya li dijî kurdiye û pankartên wan daliqandin pir bilind bûn.

Şaredariya Geverê, bi boneya Cejna Qurbanê pîroz bikin li ketin û derketina navçeyê bi kurdî pankarta "Cejna we ya Qurbanê Pîroz be" daliqand. Lê pankarta hatiye daliqandin serê sibê ji aliyê leşkeran ve anîn xwarê. Cîgirê Şaredara Geverê Cengîz Rençber, anî ziman ku dema pankart anîne xwarê ew wê demê li navçeyê bû û xwest ku mudaxeleyê li leşkaran bike. Rênçber destnîşan kir ku leşkaran gotiye wî, "Wesayîtên me ji ber pankartan derbas nabin" û pankart anîn xwarê. Rençber, bilêv kir ku helwesta leşkeran bêtehemuliya li dij kurdiye û wiha got: "Em têkildarî vê mijarê kesên berpirsiyar gazî dikin ku berpisyariyên xwe bînin cih. Ev bêtehamulî nayê qebûlkirin. Em daxistina pankartan wekî êrîşa li Îzmîrê li dijî kurdan pêk hatî dibînin."

**'Pankart 30 metre bilind bû'**

Şaredara Geverê Ruken Yetîşkin, bertek nîşanî pankartdaxistinê da û wiha got: "Me bi armaca cejna gelê xwe pîroz bikin pankart daliqandin. Lê dema ku leşker derbas bûne pankart anîne xwarê. Berê jî li navçeya me pankart anîbûn xwarê. Ev yek bêtehamuliya li dijî kurdiye." Yetîşkîn, anî ziman ku têkildarî mijar ew bi rayedarên leşkeran re axiviye û ji ber ku daketina wan asteng kirine anîne xwarê û bi zanistî neanîne xwarê. Yetîşkîn wiha domand: "Lê hevalên me diyar dikin wan pankart 30 metre bilindahiyê daliqandine. Ez dixwazin têkildarî mijarê li dozgeriyê gilî bikim. Lê ji ber ku ez dizanim ku dê bêşopandinê bidin, ez jî wekî bertek nîşan bidim giliyê nakim." COLEMÊRG




# Ceza li DTP'iyan bariya

Li navçeya Wêranşar a Rihayê li 7 DTP'iyan bi suçdariya "muxalefetiya meş û xwepêşandana kiriye" bi tevahî 17 sal û 6 meh ceza hate birîn.

Li navçeya Wêranşarê li 7 DTP'iyên ku di 26'ê cotmeha sala 2008'an de bi boneya şîdeta fîzîkî ya li dijî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan şermezar bikin daxuyanî dabûn çapemeniyê doz li wan hatibû vekirin rastî 17 sal û 6 ceza hatin.

Danişîna doza 7 DTP'iyên ku bi suçdariya "Muxalefetiya meş û xwe pêşandana kiriye" dihatin darizandin bi dawî bû.

Danişîna doza Serokê DTP'a Wêranşarê Adnan Etlî, Endamê Meclîsa Şaredariyê Halîs Aktaş, Fatma Sîlgîr, Rêveberên DTP'ê yên navçeyê Ferzende Ata, Zelal Ozkan, Salîh Şeyhun û Selahattîn Îzcî, li Dadgeha Asliye Ceza ya Wêranşarê hate dîtin. Di danişîna ku DTP'î beşdar nebûbûn de parêzeran DTP'iyan amade bû û beraeta muwekilên xwe xwest. Lê heyeta Dadgehê bi suçdariya "Li dijî qanûna hêjmar 2911'an a meş û xwepêşandanan muxalefetî kiriye" ji bo her DTP'iyekî 2 sal û 6 meh cezayê girtîgehê birî. Heyeta dadgehê li 7 DTP'iyan bi tevahî 17 sal û 6 meh cezayê girtîgehê birî. RIHA

# Li Sîlopiyê kesek hate binçavkirin

Welatiya bi navê Nesrîn Kiliç (30) dema ji Êlihê diçû navçeya Silopiyê di rê de ji aliyê polîsan ve hate rawestandin û piştî kontrola nasnameyê ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin. Kiliç, ku sedema binçavkirina wê nehat zanîn birin Midûriyeta Polîsan a Sîlopiyê. ŞIRNEX

# PÎROZBAHÎ

*Cejnên kurdan pîroz bin!*

Em ji bo ku hêviya aştî û biratiya gelan li vî welatî mezin bibe û bi ser keve hatin. Di 31'emîn salvegera Cejna Vejînê de em Cejna Qurbanê jî pîroz dikin. Niha em bi vê coş û heyecanê bi gelê kurd ê qehreman û leheng re hêviyên xwe yên ji bo aştiyeke bi rûmet û azadiyê mezin dikin.

Bi vê baweriyê em bang li hemû gelê kurd dikin ku di van rojên pîroz de li nirxên xwe yên neteweyî yên azadiyê xwedî derkeve.

Têkoşîna me ya ji bo azadiyê dê bi xwe re serkeftinê bîne.
Bi hêviya ev cejn bibin wesîleya biratî, aştî û wekheviya di navbera gelan de...

*Her du cejn li gelê kurd pîroz bin!*

**Endamên Komên Aştiyê yên Qendîl û Mexmûrê**

# PÎROZBAHÎ

Cejn, rojên ku hestên aştî û biratiyê zêdetir dibin in. Em bi hêviya gelek cejnên ku em ê bi hev re bijîn, cejna hemû gelê xwe pîroz dikin...

**Şaredarê Wanê Prz. Bekîr Kaya**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Em hêvî dikin ku cejna Qurbanê bibe wesîleya azadî, aştî û biratiyê û têkoşîna ji bo civaka ekolojîk û demokratîk geştir bike. Bi vê bîr û baweriyê em cejna Qurbanê li gelê xwe û li hemû alema îslamê pîroz dikin.

**Şaredaê Îdirê Mehmet Nûrî Guneş**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Baweriya me ew e ku cejna Qurbanê bibe wesîleya jiyaneke li ser hezkirinê bê avakirin. Hezkirin jî herî zêde rojên cejnan di nav dilê mirov de geş û gur e. Em bi vê hêviyê cejna Qurbanê pîroz dikin.

**Şaredarê Bajargê Hûrşît Altekîn**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# PÎROZBAHÎ

Ez hêvî dikim ku ev lihevhatin, di heman demê de bibe bingeha xweşbîniyê û bi xwe aştî û azadiyê bîne. Cejna gelê xwe û hemû gelên Rojhilata Navîn pîroz dikim

**Şaxa Petrolîşa Êlihê**

www.arsivakurdi.org

## PÎROZBAHÎ

Hemû kedkarên cîhanê bi hêviyên mezin û bi baweriya mirovahiyê cejna Qurbanê pêşwazî dikin. Bila cejn bibe aştî û azadiya gelan. Bi vê hêviyê em cejna hemû mirovahiyê pîroz dikin.

**Şaredara Bismilê Cemîle Emînoglû**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Em hêvî dikin ku cejna Qurbanê bibe wesîleya afirandina yekîtiya mazlûman û têkoşîna azadî, aştî û demokrasiyê baştir berz bikin. Bi vê baweriyê cejna gelê me pîroz be

**Şaredara Geverê Rûken Yetîşkîn**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Bila cejna Qurbanê ya îsal bibe destpêka jiholêrakirina sînorên di nava dilan de. Dil bibin yek û aştî û azadiyê pêkan bikin

**Şaredarê Şemzînanê Sedat Tore**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya cejn ji gelan re aştî û biratiyê bîne, cejna we ya Qurbanê ji dil û can pîroz be

**Şaredarê Şirnexê Ramazan Ûysal**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Em hêvî dikin ku bi hatina cejna Qurbanê re her kes bi êşa derdor û xizmên xwe yên feqîr û hejar hestiyar bibe û destê alîkariyê dirêjî kesê hejar bike. Bi hêviya rojên xweş û aştî cejna we ya Qurbanê pîroz be

**Firat Tarim**
**Hasan Avşar / Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Îro li hemû Rojhilata Navîn cejn e. Lê cejn, bi jiyana bê şer û pevçûn watedar e. Em cejna hemû gelên misliman pîroz dikin

**Întek Înşaat / Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Cejna Qurbanê li gelê kurd û li hemû gelan pîroz be û bi xwe re aştî, aramî û azadiyê bîne ji bo Rojhilata Navîn û hemû cîhanê

**Tekîn Kûyûmcûsû**
**Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya aştî û aramiyê em cejna gelê xwe, her wisa ya hemû gelên cîhanê pîroz dikin

**Şaredarê Pîranê Mustafa Ûygûner**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Bila bigihin hev xal û pismam hev nas bikin dûr û biyan Cenja we pîroz be Û azad bin hemû deman

**Malbata Argul / Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Em bi daxwaza pêşerojeke ronî cejna gelê xwe pîroz dikin. Hêviya me ew e ku ev cejn ji bo mirovahiyê aştî, azadî û biratiyê bîne.

**Yeşil Silvan 2 Komisyon H.Emîn Taş**
**B/30 Hala Zebze /Amed**

www.arsivakurdi.org



## Mexmûriyan her du cejn pîroz kirin

Li Wargeha Penaberan a Mexmûrê 32'yemîn salvegera damezirandina PKK'ê 27'ê Mijdar û Cejna Qurbanê bi hev re hatin pîrozkirin. Gelê wargehê piştî nimêja sibehê, çûn serdana Saziya Malbatên Şehîdan û li wir her cejna gel pîroz kirin.

Gelê penaber ê Mexmûrê li Saziya Malbatên Şehîdan cejna hev pîroz kirin û piştre kesên ku di nava pevçûna 32 salan de jiyana xwe ji dest dabûn bibîranîn û cejna wan pîroz kir. Li Saziya Malbatên Şehîdan gelê Mexmûrê peyamên girîng dan û hêvî xwestin ev cejn bibin sedema azadî û aştiyê û wiha berdewam kirin: "Em Cejna 27'ê Mijdar roja vejînê salvegera Partiya Karkerên Kurdistan û Cejna Qurbanê li Rêber Apo, şehîdên doza azadî û berxwedana gelê kurd pîroz dikin. Em hêvîdar in ku ev roj bibe pêngaveke nû û saxlem ji bo pêkanîna aştî û demokrasiya di navbera gelan de."

Piştî gelê Mexmûrê ji Saziya Malbatên Şehîdan ziyaret kirin, êdî zarokên Mexmûrê weke her carê ji bo komkirina şekiran mal bi mal geriyan. Zarokên Mexmûrê vê carê bi coş û heyecan zêde salvegera damezrandina PKK'ê û Cejna Qurbanê bi hev re pîroz kirin. Gelê Mexmûrê ev roj, rojek pir taybet nirxandin. Her wiha, dê gelê Mexmûrê êvarî bi boneya pîrozkirina 27'ê Mijdarê salvegera PKK'ê şahiyek taybet pêk bînin. **MEXMÛR (DÎHA)**

# Goristan bi gulan xemilandin

**Gelê kurd ligel tîrêjên rojê qesta goristanan kir û şehîdên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê bi bîr anîn. Girseyên li goristanan gihîştin hev, goristan bi gulên kesk û sor û zer xemilandin û soza domdariya têkoşîna azadiyê da**



COLEMÊRG





CIZÎR



MISIRC



SILOPÎ



WAN



GEVER

Bi munasebeta Cejna Qurbanê û 27'ê Mijdarê 32'emîn salvegera damezirandina PKK'ê li Amed, Wan, Sêrt, Sirnex, Colemêrg, Cizîr, Sîlopî û Hezexê bi hezaran kes çûn goristanan û gorên kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane ziyaret kirin. Girseyê di ziyaretan de xwestin ev cejn bibe sedema aştî, demokrasî û azadiya gelên Rojhilata Navîn.

**AMED:** Parlamenterên DTP'ê yên Amedê Gulten Kişanak û Selahattîn Demîrtaş, Serokê DTP'a Amedê Firat Anli, Wekîlê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Alî Şîmşek, Şaredarên Peyaz, Sûr, Yenîşehîr û Baglarê, Şaredara Bîsmîlê ya berê Şukran Aydin û nûnerên saziyên sivîl û civakî bi girseyî çûn Goristana Deriyê Mêrdîn ziyaret kirin. Girsê gora Serokê HEP'ê yê Amedê Vedat Aydin ku di sala 1991'an de hate qetilkirin û ziyaret kir û qurnefîl danîn ser gorê. Serokê DTP'a Amedê Prz. Firat Anli, axaftinek kir û cejna gel pîroz kir. Anli, diyar kir ku ew bi xêra hevalên xwe bi awayekî azad cejnan pîroz dikin û wiha got: "Em dê têkoşîna wan a aştî û demokrasiyê bidomînin." Anli piştî axaftinê cejna girseyê pîroz kir û girse piştre belav bûn.

**COLEMÊRG:** Li Colemêrgê ji serê sibê de endam û rêveberên DTP'ê endamên Meclîsa Şaredariyê, endamên Meclîsa Bajêr, endam û rêveberên İHD, KESK û saziyên sivîl jî ni davde li Taxa Kantarê civiyan û heta Goristana Bajêr ya Taxa Keklîkpinarê meşiyan. Girseya ku ji zêdeyî hezar kesî pêk dihat, li goristanê gorên endamên HPG'ê ku di 8'ê îlonê de li Geliyê Kazanê ya Çelê ya Colemêrgê jiyana xwe ji dest dabûn ziyaret kir. Girseyê di ziyaretê de ji bo kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê jiyana xwe ji dest dane rêz girtin û dua xwendin. Piştre Serokê DTP'a Navçeya Navendî ya Colemêrgê Fahrî Kurt axaftinek kir û cejna pêşengê PKK'ê pîroz kir. Kurt, diyar kir ku bi salan e gelê kurd têkoşînek bi rûmet dimeşîne û wiha got: "Ez cejna Rêberê PKK'ê Brêz Abdullah Ocalan, têkoşerên çiyê û berxwedanên zindanan pîroz dikim. Me di vê riyê de gelek bedel dan. Em hem ji bo 32'yemîn salvegera damezirandina PKK'ê û hem jî ji bo Cejna Qurbanê pîroz bikin li virin. Em hêvî û daxwaz dikin ku ev cejn bibe sedema aştî, biratî û demokrasiyê. Em dixwazin hikûmet şert û mercên Brêz Ocalan baş bike û samîmî nêzîkî pirsgirêka kurd bibe."

**ŞIRNEX:** Li Şirnexê, bi munasebeta Cejna Qurbanê li gel endam û rêveberên DTP'ê nêzî 3 kezer kes li ber avahiya DTP'a Şirnexê civîyan û çûn Şaredariya Şirnexê ziyaret kirin. Girseyê piştî ziyareta şeredariyê çûn Goristana Bajêr jî ziyaret kirin. Girsê di meşê de dirûşmeyên "Cejna te pîroz be ey Serok Apo", "Ocalan", "Şehîd namirin", "PKK gel e, gel li vir e", "Em dê cîhana bê Apo hilweşînin", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" berz kirin. Girseyê di meşê de srûda "Çerxa şoreşê" xwendin û heta şaredariyê meşiyan. Li ber avahişa Şaredariya Şirnexê Serokê DTP'a Navenda Navçeyî ya Şirnexê Menaf Sapmaz, axaftinek kir û dîyar kir ku rasthatina cejnê ya 27'ê mijarê ji bo gelê kurd pir bi wate ye û wiha axivî: "Îro em du cejnan bi hevre pîroz dikin. Hem cejna vejînê, hem jî Cejna Qurbanê em pîroz dikin. Gelê kurd di sala 1978'an de gelê kurd xwe ji tunebûnê afiran û niha têkoşîna azadiyê dimeşîne."

Şaredarê Şirnexê Ramazan Uysal jî axivî û diyar kir ku gelê kurd vejîn pêk aniye û wiha got: "Êdî divê em yekîtî û tifaqiya xwe xurt bikin. Divê em têkoşîna xwe bilintir bikin. Ji bo gelê kurd tiştê herî girîng yekîtî û tifaq e." Girseyê piştî ziyareta şaredariyê bi dirûşmeyan çûn Goristana Bajêr û gorên endamên PKK'ê ziyaret kirin. Girsê piştî li ser goristanê rêz girt û dua kirin belav bûn.

**SÎLOPÎ:** Li navçeya Sîlopî ya Şirnexê jî ligel Şaredarê Sîlopiyê Emîn Togurlu, Serokê DTP'a Silopî Yakup Taniş, rêveberên DTP'ê, rêveberên MEYA-DER'ê jî di nav de bi sedan kes li hev civiyan û Goristana Başak Şehîtlîk ziyaret kir. Girsê di ziyaretê de qurnefîl danîn ser gora Endamê HPG'ê Salîh Guleç (Çekdar Cudî) û kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane. Piştre girseyê bi boneya bîranîna kesên jiyana xwe ji dest dane deqeyekê rêz girtin. Şaredar Togurlu, li vir axaftinek kir û diyar kir ku hîn gelê kurd rastî înkar û îmhayê tê û xwest operasyonên li herêmê bi dawî bibe. Tugurlu, diyar kir ku ew naxwazin kes bê kuştin û wiha got: "Şehîdê me rûmeta me ne. Gelê kurd dê heta rawî li rûmeta xwe xwedî derkeve û têkoşîna wan bilind bike." Zi ziyaretê de dirûşmeya "Şehîd namirin" hate berzkirin.

**CIZÎR:** Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê jî, Şaredarê Cizîrê Aydin Budak, endamên Meclîsa Şaredariyê, Serokê DTP'a Cizîrê Şefik Uçkan, rêveberên DTP'ê, rêveberên Navenda Çand û Hunerê ya Mem û Zînê jî di navde komek civîyan û Goristan Asrî ya Cizîrê ziyaret kirin. Komê di ziyaretê de Gora Yahya Meneşke, Siyasetmedarên Kurd Orhan Dogan û kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane ziyaret kirin. Komê piştî ziyareta goristanê çûn li nava taxan cejna gel pîroz kirin.

**HEZEX:** Li navçeya Hezexa Şirnexê jî Şaredarê Hezexê Resul Sadak, Serokê DTP'a Hezexê Nîyazî Çevrîm, endamên Meclîsa Şaredariyê û rêveberên DTP'ê jî di navde komek çûn goristana bêkesan ziyaret kirin. Komê di ziyareta goristanê de ji bo kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane deqeyekê rêz girtin.

**GEVER:** Li Navçeya Gever a Colemêrgê jî ji serê sibê de koma ku ji Endamê Meclîsa DTP'ê Salîh Yildiz, Şaredara Geverê Rûken Yetîşkin, endam û rêveberên DTP'ê pêk dihatin çûn Goristana Bajêrgehê, gorên endamên HPG'ê ziyaret kirin. Komê di ziyaretê de rêz girtin. Piştre Hesapgirê DTP'ê û M.Salih Yildiz, diyar kir ku dewleta kur li pêşiya hesabê kur e lê kesên li hemberî kurdan hesaban dikin di nava rûpelên dêrokê de winda dibin. Şaredara Geverê Rûken Yetişkîn jî axaftinek kir û anî ziman ku ew dê li têkoşîna wan xwedî derkevin. Piştî axaftinan komê dirûşmeya "Şehîd namirin" berz kirin û belav bûn.

**WAN:** Li bajaroka Sixkê ya Wanê jî Şaredara Sixkê Nezahat Erguneş, endam û rêveberên DTP'ê û Şaredariyê çûn goristanaYalim Erez û Haci Mustafa Egilmez ziyaret kirin. Komê gorên endanên HPG'ê ziyaret kirin û rêz girtin.

**SÊRT:** Li navçeya Misircê ya Sêrtê jî koma ku ji Şaredarê Misircê Necat Yilmaz, Serokê DTP'a Fikrî Orenç û rêveberên DTP'ê çûn Goristana Asrîn a Misircê ziyaret kirin. Komê li vir gorên endamên HPG'ê ziyaret kirin û rêz girtin.



AMED



ŞIRNEX



SIXKÊ





BAZÎD

# Parêzeran banga hişyariyê kir

**Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan têkildarî rewşa muwekîlê xwe ya Girtîgeha Tîpa F a nû diyar kirin ku bi cihguheztina Ocalan mercên wî girantir bûne û rastî 20 roj cezayê hucreyê hatiye. Parêzeran got Ocalan xistine çala mirinê**

Parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrîn têkildarî şert û mercên muwekîlê xwe Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û girtîgeha nû daxuyaniyek nivîskî weşandin. Parêzaran di daxuyaniyê de diyar kirin ku muwekîlê wan di 17'ê mijdarê de derbasî Girtîgeha nû ya Tîpa F bûye û bi vê yekê re şert û mercên Ocalan girantir bûne.

Parêzaran destnîşan kir ku muwekîlê wan zêdeyî 10 salan e bi tena serê xwe di hucreya kesekî de di bin tecrîda giran de dimîne û wiha gotin: "Piştî şertên tecrîdê û raporên CPT'ê li Îmralî girtîgeheke nû hate avakirin. Piştî avakirina vê girtîgeha nû temam mû muwekîlê me di 17'ê mijdarê de neqlî Girtîgeha Tîpa F ya nû kirin. Ev girtîgeha nû ji şertê wê ji ya berê girantir in. Piştî muwekîlê me di 17'ê mijdarê de derbasî vê girtîgehê kirin û me hevdîtina yekem çêkir, di çavdêriyê me yên li ser muwekîlê me de jî hate xuyakirin ku mercên muwekîlê me pir giran in."

**'Tenê ezmanî dibîne'**

Parêzeran di berdewama daxuyaniyê de destnîşan kir ku girtîgeha nû pir biçûk e û wiha gotin: "Ev girtîgeha nû yek qat e. Serşo û daşir di heman cihî de ye. Bilindahiya wê 6-7 metre ye. Şibakeya odeyê pir bilind û biçûk e û bi derabeyê têlîn hatiye girtin. Ji ber vê yekê ode hewayê nastîne. Hundirê odeyê pir biçûk û tevgêra hundirê odeyê pir zehmet e. Ji ber şikl û kûrahiya odeyê hundirê odeyê bêhewa dimîne. Ev yek bandorek pir xirab li ser rewşa muwekîlê me dike. Rojê tenê saetekê dikare derkeve hewaxaneyê. Hewşa girtîgehê jî pir teng û bilind e. Jora hewşê jî bi telan hatiye girtin. Ji bo meşê têra 4-5 gavan heye. "

**'Çala mirinê ye'**

Parêzeran di berdewama daxuyaniyê de bal kişand ser gotina muwekîlê xwe Ocalan a 'Çala mirinê' û wiha dom kirin: "Di hevdîtina me û muwekîlê me ya dawî rewşa wî girantir bibû. Pirsgirêka nexweşiya wî ya bêhnstendinê hîn girantir bibû. Bi vê girtîgeha nû re ev pirsgirêka wî girantir bibû. Muwekîlê me ji me re wiha got 'Ez ji ber bêhewatiyê nikarin bêhn bidim û bistînim. Bi taybetî dema ez radizêm bêhna min diçike. Ez ji xewê hişyar dibim û neçar dimînim bigerim. Bêhna min li vir diçike. Êşên min girantir dibin.' Muwekîlê me vê rewşê wekî kuştin û îdama her roj dinirxîne. Reh û demarên wî dicivin ser hev. Dibêje ku wekî her roj bê darvekirin û laşê wî dicive ser hev. Dibêje ew her roj tê darvekirin û di çala mirinê de ye."

**'20 roj cezayê hucerê danê'**

Parêzeran, diyar kir ku şertên li Girava Îmraliyê yên nû di aliyê hiqûqî pêş de di aliyê civakî de sînorê jiyandinê jî ji holê rakirine. Parêzeran anî ziman ku li gorî şertên DYA û CPT'ê cihê 6 metrekare ji bo kesên 2-3 rojan binçavan de jî nayê qebûlkirin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku hucreya nû di aliyê civakî û hestiyarî de wekî şertên baş nîşan dane û wiha hate gotin: "Jiyana muwekîlê me di bin rîskên gelek cidî de ye. Disa tercîda li ser muwekîlê me bi heman giraniya xwe didome. Der heqê muwekîlê me de careke din 20 roj cezayê hucerê hatiye dayîn. Dîsa hatina girtiyên din ya Îmraliyê bi awayekî din hîn bûye. Hêj jî bi wan hukimxwaran re hevdîtin nekiriye."



Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku şertên Ocalan piştî 17'ê mijdarê hatine asteke nû û wiha got: "Mafê jiyanê yê muwekîlê me Birêz Ocalan yên bi Hiqûqa Navneteweyî û Neteweyî yên xwezayî, li gorî van şertane li ber çav nayê girtîn. Rayedarên dewletê, şert û pêkutiyên li ser muwekîlê me, bi kar tîne yên îmha û tunekirinê ne û bi van şertan, şertên jiyanê ji holê radikin. Ev pêkutî wekî "başbûn" nîşanî raya giştî da. Divê di serî de gelê kurd û hemû kesên ji bo mafên mirovan bihestiyar û derdorên demokratîk bertekan nîşan bidin. Vê yekê ji saziyên navnetewî yên wekî CPT û DMME'yê re tên veşartin."

Parêzeran di daxuyaniya xwe de anîn ziman ku pêkutiyên demên dawî yên li Îmraliyê pêk tên, tu fayde nade nîqaşên çareseriya pirsgirêka ku û bal kişandin ser van xalane: "Pêkutiyên demên dawî de yên li Îmraliyê pêk tînin, tu alîkariyê nadin nîqaşên çareseriya demokratîk yên pirsgirêka kurd. Ev pêkutî dê nîqaşên çareseriyê xirab bandor bikin. Em bang hemû kes û raya giştî dikin ku di serî de mafê jiyanê yê muwekîlê me û hemû mafên din yên jiyanê, helwestên xwe nîşan bidin û bi hestiyar bin. **STENBOL (DÎHA)**

## Însiyatîfa Gel:
## Li dijî tecrîdê bêdeng nemînin

Însiyatîfa Gel a Demokratîk a Kurdistanê bi daxuyaniyek nivîskî ji hemû gelê kurd xwest ku li dijî pêkanên li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, her der wergerînin qada berxwerdan û serhildanê. Di daxuyaniya ku bi tundî hat kirin de hat diyar kirin ku Hikûmeta AKP'ê hat hişyarkirin û wiha hat gotin: "Nêzîkatiyeke şaş a li dijî Rêber Apo, ji bo gelê kurd sedema şer e. Divê ku hemû kurdên li Tirkiyeyê û Kurdistanê li dijî vê rewşê bi ruhê serhildanê rabin û li ji vê hikûmeta şerê taybet û durû hesabê vê yekê bê pirsîn."

Însiyatîfa Gel a Demokratîk di daxuyaniya xwe de diyar kir ku tecrîd û polîtîkayên li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gihîştiye asta 'kuştin û tunekirinê' û wiha got: "Rêber Apo ev 11 sal e bi tena serê xwe dimîne û li vê rewşa giran, hêj jî ji bo biratiya gelê kurd û tirk têdikoşe. Li gel hemû pêkanînên dijwar tendurustiya xwe di plana duyemîn de girtiye. Ji bo aştî, biratî û çareseriyê têkoşiyaye û gelek caran bangên aştiyê kiriye. Ligel vê yekê hikûmeta AKP'ê tehamûlî yekîtiya gelê kurd nekiriye û bersiva bangên Rêber Apo bi îşkenceya fîzîkî bersivandiye. Serokatî terkî mirinê kiriye." Di dewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Derketiye holê ku pêkanînên AKP'ê ber bi başiyê ve nîn in û darbe ye. Bi pêkanînên nû, Serokatiyê me xistine cihekî ku mirov nikarin bijîn. Ev tiştê jî li ser tendurustiya Rêber Apo bandorên neyînî kiriye. Ji ber vê em dixwazin careke din bi bîr bixin ku dê gelê kurd vê yekê nepejirîne."

Însiyatîfa Gel a Kurdistanê anî ziman ku heke li Îmraliyê rewşeke xirab biqewime ne AKP û ne jî rayedarên tirk dikarin ji binî derkevin û wiha hat dom kirin: "Divê Erdogan û hevalên wî baş bizanibin ku gelê kurd, ji bo Serokatiyê xwe dikare Tirkiyeyê bikin cehenem. Ger ku bangên Rêber Apo yên ji bo aştiyê nebûna, heta niha bi sedan caran gelê kurd vê yekê pêkhanîtibû. Lê divê ku êdî Rêber Apo bigihîje azadiya xwe. Gelê kurd ji bilî vê, tu alternatîfan napejirîne."

Daxuyanî bi vî bangê bi dawî bû: "Di Îmraliyê de li dijî Serokatiyê me 'Çala Mirinê' hatiye çêkirin. Lê dê wê çalê aferînendeyên xwe biqurtîne. Azadiya Rêber Apo, ji bo kurdan deynê namûsê ye. Ji bo vê yekê jî em bang li hemû gelê kurd dikin ku li her derê çalakiyên rewa û demokratîk pêk bînin û em bi hev re pêkanînên hovane yên li Îmraliyê rawestînin." **AMED (ANF)**

# Gençdal: Divê gelê tirk di vê têkoşînê de cih bigire

Gerên komên aştiyê ku bi sê baskan hatine destpêkirin, berdewam dikin. Berdevkê Koma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ya Qendîlê M. Şerîf Gençdal diyar kir ku aştî bi têkoşînek civakî pêkan e û wiha got: "Em dixwazin bi civînên gel torek têkoşînê ava bikin. Divê gelê tirk jî di nav vê têkoşînê de cih bigire."



Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên li ser bangawaziya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Mexmûr û Qendîlê hatin bi sê baskan gerên xwe yên di nav gel de dimeşînin. Komên aştiyê se demên hatina xwe di civînên gel de vedibêjin û ji bo aştiyê xebatan dimeşînin. Komên li cihên wekî Amed, Wan û Şirnexê bi hezaran kesî re hatin cem hev, bi nûnerên saziyên civakî re nîqaşan dimeşînin. Komên aştiyê berovajî daxwaza Serokomar Abdullah Gul a wekî, "Bila efendî efendî li mala xwe rûnin" bi biryarin ku tora gel a aştiyê ava bikin. Komên li Amedê û tevahiya navçeyan civînên gel pêk anîn, bi DTP, ÎHD, DTSO, TUHAD-DER, Dayikên Aştiyê, Baroya Amedê, KESK, DTO, Enstîtuya Kurdî, Kurdî-Der û gelek satiyên din re hatin cem hev. Têkildarî xebatên xwe Berdevkê Koma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ya Qendîlê M. Şerîf Gençdal agahî dan û bang li gelê tirk kir ku di nav têkoşîna aştiyê de cih bigirin.

**'Gel îradeya xwe ava kir'**

Gençdal armanca hevdîtin û xebatên xwe vegotin û wiha axivî: "Em dixwazin armanca xwe ya aşiyê bi gelê tirk re jî hevpar bikin. Em dixwazin xwe bidin nasandin û gelê tirk tev li vê meşa aştiyê bikin. Em ji bo pêşerojek bi rûmet û aştiyê hatin. Gel jî bi daxwaza aştiyê em pêşwazîkirin. Aşti bi têkoşînek civakî pêkan e. Ji bo vê yekê em bi gel re tên cem hev. Malbatên zarokên xwe winda kirine bi hesterek mezin tên cem me. Di şexsê me de gel aştî û berxwedana zarokên xwe pêşwazî kirin. Me di van civînan de dît ku gelê kurd xwe wekî hêzek siyasî rêxistin kiriye. Derket holê ku gelê kurd ji bo aştiyê amade ye. Gelê kurd xwe wekî îradeyek siyasî rêxistin ki riye. Gel birêz Ocalan ji bo xwe wekî îradeya siyasî dibîne. Gel danî holê ku dixwaze bi nasnameye kazad bijî."

**'Divê muxatab bê dîtin'**

Li ser hevîtinên bi saziyên civakî re jî Gençdal daxuyand ku armanca meşa aştiyê ji wan re jî vegotine û têkildarî mijarê danûstandina nêrînan kirine. Gençdal wiha pêde çû: "Em dixwazin gavên e mbavên baş bên famkirin. Ji ber vê gerên me dê berdewam bikin. Daxwazên me yekalî nîn in. Ku pirsgirêkek hebe dualî ye. Ji bo vê yekê divê muhatab bê dîtin. Birêz Ocalan ji bo gelê kurd hasasiyetek mezin e. Lê şert û mercên wî hatine girankirin. Ev yek dibe sedema fikaran û dê bibe sedema gengaşiyan. PKK û DTP muxatab in. Em dixwazin ev cejn bibe wesîleya aştiyê û cejna gelê me pîroz dikim." **AMED (DÎHA)**

# KONGRA GEL Cejna Qurbanê pîroz kir

Serokatiya KONGRA GEL, Cejna Qurbanê ya gelê Kurdistanê û hemû gelên muslumanan pîroz kir.

KONGRA GEL bi daxuyaniyeke nivîskî, Cejna Qurbanê li hemû gelên Kurdistanê û gelên musulman pîroz kir. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Cejn, rojên hevpariyê, yekîtî û aştiyê ne. Me dixwest ku ev cejn li welatê me jî bi vî awayê bê pîrozkirin." Kongra – Gel' rewşa heyî ya Kurdistanê wiha nirxand: "Her çiqas li başûrê welat hin pêşveçûn hebin jî, xetereya li ser welatê me hêj jî didome. Li sê parçeyên din mêtîngerî didome. Serokatiyê me jî di nav de bi hezaran rêhevalên me di girtîgehan de ne. Hêj jî li bakûrê welat êrîş li ser tevger û gelê me didomin.

Em Cejna Qurbanê di rewşeke wisa de pêşwazî dikin. Em dizanin ku çi dibe bila bibe, jiyan didome. Lê dilê me bextewar e û em wekî ku dixwazin nikarin pîroz bikin. Êrîşên tundî hêj jî li ser gel, tevger û Serokatiyê me didome. Li dijî van êrîşan, berxwedana gel û hêzên azadiyê jî didome. Li hemû herêmê pirsgirêka kurd ket pêvajoyeke nû. Ji ber vê yekê em di demeke girîngre derbas dibin.



Li dijî êrîşan sekinîn, li Serokatî û tevgerê xwedî derketin, beşdarbûna refên tevgerê, sekneke li gorî xêza têkoşîn û şehîdan, dê azadiyê nêzîktir bike.

Em bi wesîleya vê cejnê careke din bang li gelê xwe dikin ku li dijî êrîşan di ber xwe bidin, yekîtiya xwe bi hêztir bikin, li nirx û Serokatiyê xwe xwedî derkevin û cejnê jî bi vî awayî pêşwazî bikin.

Em bi vî awayî Cejna Qurbanê ya Serok Apo, hemû girtiyên azadiyê, şervanên azadiyê û xebatkarên şoreşê, gelê Kurdistanê û hemû gelên musluman pîroz dikin." **BRUKSEL**

# Li Ermenîstanê pîrozbahî

Kurdên ku li Ermenistanê dijîn, 31'emin salvegera damezirandina PKK'ê li Erîvanê pîroz kirin.

Kurdên ku li bajarên Ermenistanê yên wekî Elegez, Oktonberyan, Talin, Erîvan ê dijîn, berşdarî pîrozbahiyê bûn. Di pîrozbahiyê de derbarê damezirandina PKK'ê de axaftina hatin kirin.

Dayika gerîlayekî ya bi navê Kubar Kalaşiyan jî axaftinek kir. Kubar Kalaşiyan diyar kir ku ew wekî dayîka şehîdekî roja vejîna gelê kurd pîroz dike. Kalaşiyan wiha axivî: "Îro Serokatiyê me di nav çar dîwaran de ye û dijmin nahêlin ku em bigihîjin azadiya xwe. Em azadiya xwe dixwazin. Em dê girêdayî Serokatî û şehîdên xwe bin. Gelê kurd li dijî hemû zordariyan têkoşîna xwe ya azadiyê dimeşîne."

Her wiha Davut Karasu jî pîrozbahiyê de axivî û wate û girîngiya rojê anî ziman. Karasu wiha pê de çû: "Li gel hemû pêkanînan bi serbilindî têkoşîna xwe didomîne. Em têkoşîn, têkoşîneke gelek mezin e. Êdî PKK bûye nav û nasnameya gelê kurd." **ERÎVAN (ANF)**

www.arsivakurd.org

# Cejna we pîroz be

*Cejn di dilê zarokan de xwedî wateyeke mezin e. Em jî dixwazin jiyan li gorî vê wateyê bi ser bikeve û da ku hemû rojên mirovahiyê bibe rojên aştî û biratiyê. Bi vê dilgermiya zarokan em jî cejna alemê û bi taybetî jî gelê kurd pîroz û bimbarek dikin*

**Şaredarê Sêrtê Selîm Sadak**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# Pîrozbahî

Di dîroka mirovahiyê de gelek nirx hene ku bûne xerca jiyana bi rûmet. Cejna Qurbanê jî yek ji vana ye. Hêvî heye ku bandora vê cejnê li ser jiyanê zêde be û aştî û aramiyê hakim bike.
Bi vê munasebetê cejan hemû gelê kurd pîroz û bimbarek dikin

**Şaredarê Qoserê Ferhan Turk**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

# Pîrozbahî

Li Tirkiyeyê rojeva wekheviya gelan û aştiya rûmet ji aliyê mirovatiyê ve tê nîqaşkirin
Bi hêviya ku daxwaziya gelan were cih em cejna we pîroz dikim
Îsal cejn ket roja 27'ê mehê bi vê wesîleyê em tundiya li ser jinê jî şermezar dikin û cejna jinan pîroz dikin

**Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan**
**Endamên Meclîsa Şaredarîyê**

www.arsivakurdi.org

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya rojên xweş bi xwe re bîne û avekê bi vî agirî dake em Cejna Qurbanê li hemû gelê xwe pîroz dikin

**Şaredarê Şemrexê Hasîp Aktaş**
**û Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Em cejna gelê xwe bi dil û can pîroz dikin.
Bila cej bibe wesîleya aştî û azadiyê

**Şaredarê Pirsûsê Ethem Şahîn**
**û Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Êdî bes e ev şerê qirêj. Êdî bes e ev zilm û zor. Em aştî, biratî û azadiyê dixwazin. Em hêvî dikin bi pêşerojeke ronahî û azadî em cejna gelê xwe pîroz bikin.

**Şaredara Dêrika Çiyayê Mazî Çaglar Demîrel**
**û Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Her cejn biharekê tîne ji bo mirovan
Her cejn geş dike dil û hestan
Cejna we pîroz be. Bi hêviya biratiya gelan.

**Şaredarê Farqînê Fadil Erdede**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

## PÎROZBAHÎ

Daxwaza me ew e ku cejna Qurbanê bibe wesîleya aştî û biratiyê û pêşerojeke bi biratî û wekheviyê. Bi van hest û baweriyê em cejna gelê xwe û Rojhilata Navîn pîroz dikin

**M.Bakî Aksoy**
**FOTO ZELAL**
**Mevlana Halît Mahallesî**
**Ogretmenler Caddesî 1 Nolu**
**Turk Telekom / Amed**

## PÎROZBAHÎ

Em Cejna Qurbanê li hemû gelê kurd û li gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin. Bila cejn bibe sedema rûmetî, wekhêvî û biratiyê

**Mezopotamya Ticaret**
**Mehmet Bûrak**
**0532 394 58 39 Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Em bi hêviyên germ, bi daxwaz aştî û azadiyê cejnê pêşwazî dikin. Cejna Qurbanê li hemû cîhanê pîroz dikin

**Han mobilya - Musa Han**
**Amed**

## PÎROZBAHÎ

Cejn be pelên dara min
Cejn be rojên welatê min
Aştî û biratî be jiyana mirovê min
Pîroz be cejna gelê min

**Abdûrahman Kandemîr**
**Nûnerê New Hollandê**
**Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya ku cejna Qurbanê nirxên biratî, aştî û demokrasiyê bilind bike, cejna gelê xwe ya Qurbanê pîroz dikin û ji gelê xwe re xweşbînî, aramî û dilşadiyê hêvî dikin

**Mehmet Tûnç / Amed**

## PÎROZBAHÎ

Cejn bi awayê sembolîk be ji rojên geş û xweş bi bîr tînin. Em ji bi hêviyên têr û tijî ji bo her kesî siberojên geş dixwazin û cejna gelê kurd û hemû mirovahiyê dikim.

**Mezopotamya Center**
**Serdar Giyîm**
**Bismil**

## PÎROZBAHÎ

Di cejnan de aştî û biratî temaya sereke ye. Hêviyên însan di van rojan de xurtir aştiyê bi bîr tîne. Bi van hest û daxwazên xweş û geş ceja hemû mirovahiyê û bi taybetî ya gelê kurd a Qurbanê pîroz dikin.

**KESK 1995 Şaxa KESK'ê ya Amedê**

## PÎROZBAHÎ

Bi hêviya rojên xweş û azad Cejna Qurbanê li hemû gelê misilman û bi taybetî li gelê kurd pîroz be

**Mezra Înşaat / Amed**

## PÎROZBAHÎ

Roşan şima qurbanî ez zerba xo bimbarek kena, wazen wa roşan şaranî marî rî aştî û biratî bîya ro

**Abdûllah Peker**
**Pekerler Komisyon Hala Zebze / Amed**

www.arsivakurdi.org

Rupel 12+++++++:Layout 1 27.11.2009 14:23 Page 1

ROJEV
28 Mijdar 2009 Hejmar: 16 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com



# Eleqe ji bo xurmeyan zêde ye

Heciyên başûrê Kurdistanê 135 hezar lître ava zemzemê û 100 ton xurme ji Siûdî Erebîstanê kirîne.

Misliman wek kevneşopiyekê dema ji bo wecîbeya xwe ya olî 'hecê' bînin cih diçin Siûdî Erebîstanê. Hecî di vegerê de diyariyên cur bi cur dikirin. Van diyariyan li xizmên xwe û kesên ku diçin serdana wan belav dikin.

Di vê çarçoveyê de îsal hejmara heciyên herêma Kurdistanê 4 hezar û 500 hecî ye. Heciyên ku ji wir tên zêdeyî 135 hezar lître ava zemzemê û 100 ton xurme kirîne û niha bi barkirin û veguhestinê ve mijûl in.

Berpirsên heciyên Herêma Kurdistanê ragihandin ku tenê mesrefa av û xurmeyên heciyên Herêma Kurdistanê ku ji Siûdiyê kirîne ligel mesrefa veguhestinê digihîje yek milyon dolarî. Xurmeyên ku ji hecê tên herî zêde li Dihok û Hewlêrê tên firotin. Xurmeyên hecê ji Sûriyeyê îxracê Hewlêrê dibin û li ser Hewlêrê tên Tirkiyeyê. **AMED**

# Ji bo deng nedanê riya gundê wan venakin

ERDOGAN ALTAN - QERS / DÎHA

Gundiyên gundê Çengila bi ser navçeya Kaxizmanê ya Qersê bi salane ji ber dewlet riya wan çênake bi îmkanên xwe û bi makînayên kar ên Şaredariya Kaxizmanê ya DTP'yî hewl didin riya xwe çêbikin.

Ligel ku Serokwezîr Recep Tayip Erdogan îdia dike tu gundên bê av û ceyran nemane jî li gundê Çengila navçeya Kaxizmana Qersê rewşek berovajî heye. Bi salane riya gundê Çengilê nayê çêkirin. Gundiyên hêvî ji dewletê birîn, bi îmkanên xwe dest bi çêkirina rê kirin. Her wiha di çêkirina rê de Şaredariya DTP'yî ya Kaxizmanê jî bi makîneyên xwe yên kar alîkariya gundiyan dike. Şêniyên Çengiliyê diyar dikin ku her çiqas wan gelek caran ji bo çêkirina rê serî li Qeymaqamtiya Navçeyê û Îdareya Taybet a Qersê dane jî, tu encamek negirtine. Li ser vê yekê gundiyên bi salane xêr ji rayedarên dewletê nedîtin, li çareya xwe dinêrin.

Şêniyên gundê Çengiliya 500 xanî û 3 hezar nifûs, anîn ziman ku ji ber wan di hilbijartinan de dengên xwe dane DTP'ê vê jan û êşa rê dikişînin.

Keyayê gundê Çengiliyê Hayrettîn Ozkan, diyar kir ku sedema çênekirina riya gundê wan xeletiya polîtîkaya AKP'ê ye. Ozkan, da zanîn ku ev 6 sal e keyayê gund e û bi salane êşa neçêkirina rê dikişînin. Ozkan, destnîşan kir ku ji bo çêkirina rê wan gelek caran bi daxwaznameyan serî li Qeymaqamtiya Navçeyê û Îdareya Taybet a Qersê dane lê tu encam negirtine. Ozkan, ev tişt gotin: "Dema em serlêdanê dikin, endamên Meclîsa Giştî ya Bajarê Qersê Mehmet Demîr û Mehmet Karadenîz û teşkîlata wî bertekê nîşanê me didin. Bi vê re ji me re dibêjin 'em niha dikarin riya we çêkin û xilas bikin lê ne niha'. Lê em dizanin çima wisa dibêjin, ji ber ji vê gundî di hilbijartinan de ji wan re deng dernakeve ye. Ev zilm û zordariyê ji ber vê ye li me dikin. Ji me re ne qrêder û ne jî dozerê dişînin. Her sal ji bo gundan ji hêla Îdareya Taybet a Qersê çîmento, komir û sotemenî divê bê dan. Didin her gundî, lê ji gundê me re nayê şandin. Em bi salan e vê îşkencê dikişînin. Her tim Serokwezîr derdikeve, dibê wê tu gund bê av û rê nemînin. Lê ma em kî ne, çima vê zilmê ji me re rewa dibînin. Em diçin ber deriyê kîjan daîreya dewletê, deriyê li rûyê me digirin. Em dê bi îmkanên xwe riya xwe çêkin, lê em dê dersê pêwîst jî bidin AKP'ê."

Endamê Meclîsa Giştî ya Bajarê Qersê ya DTP'yî Haydar Yildiz jî, diyar kir ku çêkirina rê her tim dibin rojeva Meclisa Giştî ya Bajar jî, tu xebat nayê kirin. Yildiz, da zanîn ku her çiqas gundê Çengiliyê, li gor mezinbûnê, li herêmê gundê herî mezin û nifûsek qelabalix be jî tu xizmeta nayê kirin. Yildiz, anî ziman ku sedema neçêkirina rê siyasî ye. Yildiz, derbirî ku ligel vê jî dê bi niştecihên gund re riya wan çêkin. Serokê Rêxistina DTP'ê ya Navçeya Qaxizmanê Yaşar Ozlu jî, da zanîn ku ji ber neçêkirina riya gundê Çengiliyê gundî mexdûr dibin. Ozlu, destnîşan kir ku gundî bi îmkanên xwe û bi alîkariya Şaredariya Qaxizmanê dê rê çêkin. Ozlu, anî ziman ku ev gund ji hêla daîreyên dewletê ve tên tecrîdkirin. Ozlu, wiha pê de çû: "Rayedarên dewlet û hikûmetê diyar dikin ku dê tu gund bêav û rê nemînin. Vaye gundê Çengiliyê ji ber di hilbijartinê de dengê xwe dide DTP'ê riya wan nayê çêkirin. Wan mexdûr dikin. Bi vê yekê re jî di vê gotinê de çiqas samîmî ne derdikeve holê."

**Gundiyên Çengila Kaxizmanê ji ber ku dewlet riya wan çênake zehmetiyên mezin dikişînin. Gundî û şaredariya DTP'ê Kaxizmanê niha bi hewldanên xwe rê didin çêkirin**

# Welatiyan berê xwe dan mazadê

Roja yekemîn ya cejna Qurbanê welatiyan berê xwe da mazada sewalan. Welatiyan diyar kirin ku ji ber ku îsal buha zêdene li benda roja cejnê sekinîne ku buhayê qurbanan dakevin. Welatî li mazadê geriyan û daxwaza wan ev bû ku li gorî butçeya xwe qurbanê bikirin. Her wiha welatiyan bi xwediyên sewalan re bazar kirin. Nîqaşên û gotinên wan bi deqeyan berdewam kir. Dem dem dikeniyan dem dem ji bo buha li hev nekirin.

Pez buhayê wan serê sewalê ji 350 dest pê dike û hetanÎ 500 diçe. Dewa jî ji 2 hezar TL yî dest pê dike. Welatî ji zêdebûna buha nerazîbûnên xwe anîn ziman û sewalfiroşan jî ji firotinan nerazîbûnên anîn ziman. Her wiha welatiyên ku sewal kirin jî dema ku dibirin cihê serjêkirinê demên zehmet jiyan. **AMED**




# Fezayî di nava me de dimînin



Zanyarên Enstîtuya Lêkolîna Fezayî ya Bulgarîstanê îdia kirin ku li cîhanê fezayî hene.

Rojnameya Daîly Telepgraph di nûçeyeke xwe de diyar kir ku li gorî çapemeniya bulgar, Cûgirê Enstîtuyê Lacherzar Fîlîpov diyar kiriye ku der barê hebûna fezayiyan de lêkolîneke dane destpêkirin. Rojnameyê da zanîn ku li gorî lêkolîna wan hatiye îdiakirin ku li cîhanê fezayî hene û wekî dostan di nava me de digerin.

Hate diyarkirin ku enstîtuyê hemû sembolên ku ji bo wan hatiye şandin, li ser xebat dane destpêkirin. Cîgirê enstîtuyê Fîlîpov îdia dike ku bi jiyana derveyî cîhanê re têkiliyên wan hene û got ku dê ji bo tiştên nayên zanîn bibin bersiv. Her wiha Fîlîpov dibêje ku gelek tiştî lêkolînan dimeşînin. Fîlîpov wiha dirêjî da axaftina xwe: "Fezayî di nava me de dijîn. Me dişopînin. Ne neyarê me ne. Dixwazin alîkariyê bidin me. Lê em nikarin bi wan re bikevin têkiliyê. Vatîkan jî hebûna fezayiyan qebûl dike. 15 sal şûnde dê mirov bi jiyana derveyî cihanê re bikevin têkiliyê." **SOFYA**

# Li Amedê operasyona CD'yên korsan

Li Amedê li hemberî seyarfiroşan operasyonek pêk hat û 11 hezar û 456 CD'yên fîlman û lîstikên korsan hatin desteserkirin.

Şaxa Ewlekariya Birêvebiriya Emniyeta Amedê, li ser îxbarekê bi ser 5 kargeh û depoyekê de girtin. Di serdagirtinê de 4 hezar û 100 qarton goşt, 1999 DVD'yên fîlman ên bêbandrol, 835 CD'yên bêbandol ên lîstikan, 4 hezar û 348 CD'yên bêbandrol, 10 CD'yên porno hatin bidestxistin. Her wiha 2 qasayên komputerê, 4 dîskên derve û cîhazên ku di zêdekirinê de tên bikaranîn hatin bidestxistin. 5 kesên ku hatin binçavkirin, li gorî yasaya bi hejmara 846 ya Qanûna Berhemên Hunerî û Fikrî û li gorî Qanûna Cezayê Tirk ê benda 226 bo edliyeyê hatin hênartin. ***AKnews***

# Hêştiran kovî gund dorpêç kirin

Li Awustralyayê reviyeke hêştirên kovî ku ji 6 hezarî pêk dihat xwe berdan nava gundekî. Li ser vê yekê gundî ji ber tirs û fikarê nekarin derkevin derve.

Li bakurê Awustralyayê wezîrê Îskanê Rob Knîght li herêma Darwîn di meclîsê de daxuyaniyek da çapemeniyê û diyar kir ku li gundê Docker Rîwer ku nifûsa wan 350 kes nikare ji ber hêştirên kovî derkeve derve. Knîght wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev çend hefteye hêştirên kovî xwe berdane gund. Hemû tesîsên avê texrîb kirine. Li gund gelek sewal telef bûn. Ev jî rê li pirsgirêkên tenduristiyê vedikin. Her wiha ev hêştir zirareke mezin didin sewalên gund. Her wiha riyên hatin û çûyînê jî îstila kirine. Niha gund di bin dorpêçê de ye. Rewşa gund ne baş e." **CANBERRA**

# 23 salan bi xeyalan nîvmirî jiya

Li Belçîkayê li kesê bi navê Rom Houben di encama qezaya trafîkê de teşhîsa nemir-nejî hate kirin. Li ser bûyerê 23 sal derbas bûn. Piştî 23 salan derket holê ku zêhna wî hişiyar bûye. Li gorî rojnameya Îngîlîz kesê bi navê Rom Houben 23 sal ber di qezaya trafîkê felç bûye. Doktoran wê demê teşhîsa nemir-nejî lê kiribûn. Lewre derket holê ku Houben bi salan e bi xeyalan dema xwe derbas dike. Doktoran heta niha Houben di bin gelek testan re derbas kir. Di encama hemû lêkolînan de derket holê ku ligel ku laşê wî hemû bê bandor maye, zêhna wî hişiyar bûye. **BRUKSEL**

